Hevpeyvîn bi mamoste Nesredîn İbrahîm re
- Sekreterê partiya dîmoqrat a Kurd li Sûrya (Alpartî)

Mamoste, weşana NEWROZ dilxweş û şa ye ku, di vê hevdîtinê de li we guhdariyê bike, raman, hizir û bîrbaweriyên we, derheqa derd û êşên gelê me yê Kurd biguhêze xwendevanên xwe. Gelekî bi xêr û xweşî hatî.

B *-Di destpêkê de ez sipasiya* ***NEWROZÊ*** *dikim. Bi rastî ew stêrkek geşe, di warê wêjeya kurdî de,hemî cûre tê de peyda dibin, ez yek ji xwendevanê wê me.*

1-Piştî van guhertinên mezin di hemî warên jiyanê de li cîhanê, hûn paşeroja gelê Kurd bi tevayî û gelê me yê Kurd li sûriyê bi taybetî çawa dixwînin?

-Bê *goman ev guhertin bingehîn in, ji ber li ser tuştine taybetmendî ne. Belavkirina demokrasiyê yek ji navnîşanên wê ye. Herifandina Yekîtiya Sovyêt, rijêma Talban û ya Şawşîsko, ji hêlekê ve, ji hêla din ve jî roxandina rijîma sedam ê dîktator,bicîkirina fedraliyetê li Kurdistana Başûr, ev guhertinê han senter bûn di herema me de, bêgoman wê rola xwe biguhêze dewletên derdorî xwe . Ji ber bayê demokrasiyê rabûye, û miletê Kurd wê ne derveyî van guhertinan be li hemî parçên kurdistanê.*

2- Hûn rewşa Tevgera Kurdî li Sûriyê çawa dinirxînin? Çi kar û xebat ji bal partiya we ve ji bo yekirina gotina wê dibe?

B- *Di van rewşên awarte de, ku bihtir ji 40 salî li welatê me, tê meşandin Tevgera Kurdî ta nuha kariye hebûna xwe biparêze. Li gor Kanîna xwe, pirsgirêka kurdî pêşde dide. Ji aliyê din ve jî, xal in hene ji wan dikaze, weke parçebûna ne suruştî ya balkêşe. Nuha em hewil didin ku tevger were ser hev. ji vê me xwest ku DÎTİNA HEVBEŞ bibe programek siyasî, û gerek em haziriyê ji kongirek netewî Kurdî re li Sûriyê bikin. Y bihtir giring avakirina LÊVEGEREK Krdî ku karibe nûnertiya miletê me yê Krd li Sriyê bike.*

3- ENÎ û HEVBENDÎ ya kurdî di ragihandina Şmê de cih girtine,hin gazin têne kirin,ku di belgenameya wê ya bingehîn de , mafên gelê me yê Krd bi xurtî cih negirtine. Di vî warî de hûn çi dibêjin ?

B- *ev cara yekem bû ku,me karîbû hebûna doza kurdî li bal opozisyona demokrat li sûriyê bidin çûnrayêkirin, agihandina Şamê bi xwe jî tîpne qalind in , daxwazê endamê xwe teva têr nake,lê belê xal in hevbeş di navbera wan de peyda bûne û bûye bingeha pêşveçûna demokrasiyê. Ya balkêş ew e ku, ev ragihandin qizinceke mezin û gaveke hêja ye .*

4- Îro HEVBENDÎ û ENÎ ya Kurd karên hevbeş bi hevre dikin, ev yeka han cihê dilxweşî û pîroziya gelê me yê Kurd e. Gelo hûn di HEVBENDÎ û ENÎ yê de hewil didin ku encumenek ⟶